# Firavîna Rovî

06

Çîrokeka folklorî



www.araratgroup.info

ARARAT GROUP

WEŞANXANEYA ŞILÊR
شلير للنشر

Yek ji projeyên Ararat Groupê ye.

**Birêveberîya projeyê:**

Silêman Osman - Raman Hesê

**Edîtor û sererastker:**

Ara Zarok

**Nîgar:**

Nêçîrvan Ehmed

**Dîzayin û amadekarî:**

Mihemed Osman

Hesan Mihemed

Şînda Ekrem

Cûdî Elî

Weşanxaneya Şilêrê, Qamişlo

weshanashiler@gmail.com

www.shlier.info

Çapa yekê
Qamişlo 2022'ê

Çapxaneya şehîd Herekol, Dêrik

+963 989 966 863 @arazarok.online Ara Zarok
@arazarok_online @arazarok.online zarok@arasat.online

©Hemû maf parastî ne.
www.arasat.online/zarok

Hebû, tine bû.

Rojekê li deşta Amûdê Şêrekê ciwan rastî Rovîyekê kal hat.

Çaxê Rovî Şêr dît gelekî tirsiya û xwest ku bilez ji wê derê bireve. Lê wî bala xwe dayê ku ev Şêrê han hov xuya nake û rûyê wî jî bi ken e.



Rovî deng jixwe neanî û li cihê xwe rûniştî ma, tirsa xwe neda der û ji Şêr ra got:
"Rojbaş Şêrê ciwan! Rojbaş şahê tebayan! Wey tu bi xêr hatî, li ser her du çavên min hatî. Fermo, bide ferman!"

Şêr li Rovî vegerand û got: "Rojbaş hevalê Rovî! Tu çima wilo jar û melûl î?"



Rovî bi gotinên Şêr ên nerm pir şa bû, tirs ji dilê xwe avêt û ji Şêrî ra got: "Qiralê min; wek tu dibînî, ez pir kal bûme, ti kes li dora min nemaye û ez nema dikarim nêçîrê jî bikim.
Lewma ez li benda qiralekî weke te mame, ku ez jê ra bibim xizmetkar û her gavê parastina wî bikim."



Şêr girnijî û serê xwe ji Rovî ra hejand. Wilo hevaltîya wan her duyan dest pê kir.
Rovîyê hîlevan bû hevparê nêçîra Şêr û jîyana wan wisa derbas bû.
Wextek derbas bû, Şêr çend roj li ser hev ti nêçîr bi dest wî neket. Wî û Rovî dan rê û çûn çîyayekê bilind.

Li kevîya çîyê newaleka kûr hebû, çaxê di ber da derbas dibin; ji nişkan ve Rovî bi dengekê bilind dibêje: "Aaax, ax! Ax ji derdê nebûna lehengan!"



Dema ku Şêr ev gotin bihîstin, ew tavilê di cihê xwe da rawestiya, çend awirên tûj ji Rovî vedan û got: "Tu çi dibêjî kuro! Rovîyê tirsonek! Ma kes ji min lehengtir heye?"

Rovî xwe kelogirî kir û bi melûlî got: "Rast e şahê me yê delal, tu leheng î, lê bavê te yê dilovan ji te lehengtir bû!"



Şêr li Rovî vegerand: "Çi tiştê wî ji yê min lehengtir bû?"

Rovî bi dengekê nizim got: "Her cara ku em digihan vê derê; bavê te yê dilovan bi mêranî xwe ji vî alîyê newalê diavête wî alîyê din.
Heya ez bi meşa xwe ya rovînî digiham alîyê din, wî ciwanmêrî zikê xwe têr dikir û para min jî ji ber wî dima!"



Bi van fort û dewrên Rovî rebenê Şêr mat bû û seyr jê dipirsî: "Bavê min ê kal?! Wî çawa dikaribû xwe ji vî alî biavêje alîyê din? Ma çawa bû!!! Ez bi çavên serê xwe bibînim, bawer nakim!"
Rovî dît ku Şêr ketiye nav gumanan.

Wî dîsa xwe li ber Şêr nizim kir, berjor lê nihêrî û got: "Qiralê min ê leheng! Ez Rovîyê kal, ji riha xwe şerm dikin, hema bi van takên spî mabe; ez derewan li te nakim! Ez ê qet qencîya ku bavê te bi min dikir ji bîr nekim. Wî ciwanmêrî ez rojekê jî birçî nehiştim."



Piştî van gotinan; Şêrê min û te serê xwe ber bi jor ve rakir, kire borebor û got: "Ez lawê wî Şêrê leheng im. Ez ê ti carî nehêlim ku Rovîyekê zexel weke te loman ji min bike û bi çavên tirsonekan li min binihêre!
Ha va ye ez ê jî xwe biavêjim wî alîyê newalê. Zû xwe bigihîne para xwe ya nêçîrê!"



Tavilê Şêr çend gavan bi paş ve vegeriya, pirça xwe qij kir û bi hêzeka mezin xwe avêt, lê negiha kevîya din û li ser tehta binê newalê ket.

Rovî bixwe dizanî ku Şêrê ciwan wê ti carî nagihe alîyê din ê newalê.



Piştî ketina Şêrî, Rovî di bin simbêlan ra dikeniya.

Hêdîka berê xwe da binê newalê wexta giha cem Şêr, dît ku gelekî perîşan bûye, dikir kazekaz û nalîn.

Rovî li dora wî çû û hat, Şêr jî nikaribû xwe bilivîne û ji cihê xwe rabe. Rovî, ji paş ve giran giran nêzîkî şêr bû û dest avête terîya wî ku bixwe.



Şêr li halê xwe nihêrî, ramiya; wî çi anî serê xwe, bawerî da rovîyê xapînok!

Wî hewl da ku rovî nêzîkî devê wî bibe û keysa xwe lê bîne.



Şêr bi dengekê xemgîn û dilekê şkestî ji Rovî ra got: "Birayê hêja! Va ye ez dimirim, lê dîsa jî dixwazim xizmetekê ji te ra bikim, da ku tama devê te hîn xweştir bibe! Goştê sînga min ji yê terîya min zaf xweştir e.



Rovî lê vegerand û got: "Zorspas! Şîreta te li ser çavên min, lê wextê min bavê te jî xwar; min bi terîyê dest pê kiribû."

ARA ZAROK

Çêja jîyîna zarokên Kurdan e!

